Lewma pêwîst e ku têkiliyên kurdan û bi taybet parastvanên me, lehengên YPG & YPJ'ê li ser vê bingehê tevbigerin. Ez ne şîretan li wan dikin ew bêtir karê xwe dizanin, lê belê xwendina wan ji rewşa têkiliyên navdewletî û bi taybetî têkiliyên ligel împeratoriya Amerîkî nayê fêmkirin, weke mînak hêzên YPG, YPJ digotin em naçin operasyona rizgarkirina bajarê Reqayê çimkî em ji êrîşa tirkiyê bi gumanin, ji ber ku pişta me ji tirkiyê nerast e û dibe ku dewleta tirk êrîşî me ji piştê bike! Lê di dawiyê de ev hêza piraniya xwe kurdî ye û nûnertiya rûmeta gelên Rojava dike ragihand ku ew ê ligel hevpeymana navdewletî ya li dijî Daîş´ê tevlî operasyona Reqayê bibe. Nûçeya kampax û karest jî ew e; ku gumanên hêza me ya rewa û xwedî tecrubeya herî zengîn di cihê xwe derket û faşîzma dewleta tirk û bi taybet dîktatorê bi navê Erdogan artêş û balafirên xwe ligel çeteyên ji bermayên artêşa azad şande ber bi Mibijê û anha gundên hawîdorê bi tundî topbaran dike, mirovê sivîl şehîd dikivin û gund wêran dibin. Ev êrîş jî yekser piştî ragihanina hêzên YPG´ê derbarê vekişandina ji Minbicê de; da, ku tevlî operasyona Reqayê bibin. Gelo Amerîka garantî nedabû kurdan? Gelo çima Amerîka bi awayekî eşkere helwesta xwe derbarê dagirkeriya dewleta tirk ji xaka Rojava re; diyar nake??!! xwedêgravî kurd û Amerîka hevalbendin. lê di heman demê de amerîka û tirkî ji hevalbendin û alîgirin!
Ji xwe qaşo rêjîma sûrî deqerûtî derbas kiriye û erdên di nava sîrnorê fermî (ango çêkirî) yên dewleta xwe nabîne yan bi kêfxweşî firotiye tirkan! Û zimanê rewşê û halê hazir dibêjin ku hevalbendên rojavayî, çavên xwe girtine. ew hevalbend û alîgirên azadiya mirovan anha bi planên xwe mijûlbûne û mîna derfeteke zêrîn li wêranê dinêrin.

Şêrko Ebdulrehman

Mirovino...! Ma Gelo Hişyarî Ne Pêwist e?

Ji berê ve, îro jî wiha ye, di jiyana xweristê de, tu rêz û rûmet ji qelsan re tune ye. Li daristanê, û li gora zagona wê, jiyan tenê para xurt û hêzdaran e, siîl û belengaz jî, ji dirindeyên hov re taştê, firavîn û şîv in.
Sed mixabin ku di civaka me ya mirovahiyê de jî, îro ew zagona kirêt, serdest û desthilatdar e, ya ku bûye egera peydabûna gelek pirsgirêkên vê serdemê...Ew pirinsîp û nirxên giranbuha ku civaka mirovahiyê dixemilandin, ji ya ajalan cuda dikirin, bar kirine û winda bûne.
Bi çûn û windabûna wan nirxên pîroz, giyanê mirovahiyê çilmisî ye, pûç, ziwa, ronahiya wê melûl bûye, û tu wate ji bextewerî, spehîtî û xweşiyê re nema ye...! Ma di siha vê hovîtiya reş a bê sînor û dîdarên kuştina rojane de çawa dê mirov bi bextewerî, spehîtî û xweşiya jiyanê hest û şa bibe?!..
Li hawîrdora me, li Bakurê Afrîkayê û hin deverên din ên cîhana me, çawa tu awirên xwe digerînî, ji şer, pevçûn, talankirin, xizanî û kuştinê pê ve, tiştekî din nabînî!..Li her cihî, golên xwîna sor a mirovan. Li her cihî, dû, doman, giriyê zarokan, rondikên pîr û kalan, hawara jin qîzan e...Dest, tilî, lingên jêkirî yên mirovan li gund û bajarên wêrankirî bi piranî têne dîtin...!
Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku nirxên mirovahiyê ji hiş û giyanê siyasetmedar û berpirsên vê serdemê bar kirine, li şûna wan, hovîtiya kor a malwêran konê xwe vegirtiye, lê cîwar bûye...!
Meger rewşenbîr, zanyar, fîlozov û xebatkarên mafê mirovan li seranserî cîhanê bê derengî bi rola xwe ranebin û erkên xwe nebînin û bi vîneke hevbeş ji bo bicihkirina zgoneke nûjen, kêrhatî û dadmend ji rêxistina navnetewî re mil li mil xebatê nekin, koka rijêmên diktator ên ku ew jêderên sereke yên terora cîhanê ne, hilneweşînin, mafên gel û mirovan misoger nekin û jîngehê ji gemarê neparêzin û...hwd, dê ademîzadî toşî metirsiyên mestir bibe, hebûn û jiyana mirovan ser vê gogzemînê têkeve ber gefan... Mirovino! ma gelo, hişyarî ne pêwist e?!.

Newafê Bişar

Misogeriya Mafê Gelê Sûriyê

Li Sûriyayê çi dibe?, çi tê kirin..kî bi ser dikeve.. kî têk diçe?. Gelo Sûryayê hewqas giringe ku di rojeva hemû dewletê Cîhanê de cihekê balkêş digre?.. Gelo ev kuştin û wêrankirina lê tê kirin di bercewendiyên kê de ne.. Çima kesek bi cidî li ser çaerserkirina aloziya Sûryayê nasekine.. gelo mirov ronahî û geşbînekê di hundirê vê tarîkê de dibîne.. yan her kes dixwaze perçê herî mezin ji xwe re bibe.
Ev pirs û hin pirsên dinê jî bala her kesî dikşînin û bi taybet yên li ser xaka Sûryayê jiyan dikin, ku Rojavayê Kurdistanê jî perçakî serekeye, Ji ber ev tevlî heviya li Sûryayê çêdibe kurd jê ne bê parin!. Di demeke nêzîk de qêrana Sûryayê sala şeşemîn derbas dike, çavê dunyayê bi tevahî li sere, lê mixabin ew rihê çareserkirinê nîne, ji ber her kes dixwaze bi rengê xwe çareser bike û fêdeya herî mezîn lê bibe. Çi biserê gelê Sûryayê bê, bi temamî bê rûxandin çavê xwe jê digrin, lê li cem wan ya herî giring çi bi dest bixin xêr û bêra wê çawa li hev par bikin. Di vir de pirsek bala min dikşîne ma gelo dewletin mezin û bi hêz mîna Emerîka, Rûsiya, Elmaniya yan jî Netewê yekbûyî di derbas bûna 6' salan nikarin vê pirsgirêkê çareser bikin...!?
Ez bi gumanim ku sedema nedîtina çareseryê nakûkiyên ku dinav wande derdikevin, dema ku li hev kirinek di nav bera wan de çêbibe helbet wê çareserî jî bê dîtin çimkî Sûriyê bûye qadeke şerê nav netewî û bi taybet Emerîka û heval bendên wê û Rûsiya û heval bendên wê ku her yek ji wan dixwaze Sûrya pêşe rojê bi reng û dengê wî be, herdû jî dizanin ku hev karên wan li ser erdê nebin ev yek nayê cî bicî kirin. Rûsiya bi piştgiriya rêjîmê dixwaze armncên xwe pêk bîne, Emerîka jî dixwaze li himberî Rûsyayê hebûna xwe diyar bike. Ji loma destek da hin gurûpên radîkal yên qaşo bi navê artêşa azad, lê piştî demekê armancên wan zelal bûn û xwestekên wan eşkere daketin holê ku girêdanên wan yan bi rêjîmê re ne yan bi terorê ve girêdayî ne. ji ber vê yekê hêza Sûriya a dîmoqrat xwe li ser wan ferz kir ku bê piştgirî kirin, di vir de dewletin herêmî mîna Tirkî, Si'ûdiyê û Qeterê ne razî bûna xwe dest nîşan kirin û raste rast destek dan komên çete mîna "Cebhet elnusra,Ehrar Elşam û Ceyiş Elîslam" mebesta wan jê ku li dijî Kurdan bi kar bînin û pîlanên çareseriyê vala derxînin. lê yê bedêlê giran datîne gelê Sûriyê ye!, ku bi sed hezaran kuştî, birîndar û girtî, bi melyonan koçber û bi sedan bajarên wêran kirî!!. Gelo kengî wê wijdanê van dewletan ji xew şiyar bibe û bi erkê xwenî civakî û exlaqî rabe, yan hîna jî kela wan li gelê Sûryayê hênik nebûye, yan jî li benda ku ti tişt jê nemîne Wê çaxê belkî bigihên biryara çareserkirinê. Piştî bazirganan ker tevlî kurtan ji xwe re birin û li hev par kirin, ev e armanca berdewamiya şer û aloziya li Sûryayê didûme, roj bi roj gurtir dibe. Ev yek destnîşan dike ku bi dehan civînê bi navê alîkariya gelê Sûryayê li dardikevin hêviyên çareserkirinê têde nayêne dîtin, ji ber her yek li bercewendiyên xwe dide pêş. Vê yekê hişiyariyek li cem pêkhatiyên Sûryayê dest nîşan kir, ku xwe bixwe riyeke çareseriyê ji xwe re bibîne û birînê xwe derman bike. Ev riya çareseriyê ji Rojava dest pê dike ku îro federalîzm xistiyê rojevê de û her kes beşdarî biryara damezirandina wê kiriye û karekî pir bi rêk û pêk jê re hatiye kirin,ew nimûneya herî li pêşe di bi dawî kirina aloziya Sûryayê de ji ber biryara erêkirina wî di destê gelê Sûryayê de ye.ji ber em tev dizanin ku tu kes maf û azadiyê li ser sifreke zêrîn diyarî me nake!? gel jî baş agahdarî van lîstokan bûye, û biryara xwe daye ku heta dawî wê li ber xwe bide û şoreşa xwe bi ser bixe, Wê çaxê kêm zêde mafê her kesî tê diyar û misoger kirin.

Refîq Îbrahîm

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Hunermend Xêro Ebas: Bi Saya Şehîdan Em Di Vê Aramiyê De Dijîn

-Ez gelekî şad bûm dema ku ez hatim Rojava û min sazî û hêz û hikûmet û perleman dîtin.
-Derhêner Huner Selîm dixwest ez di filmekî wî de beşdar bibim, lê bi rastî min xwe tê de nedît.
- Divê kesê hunermend bêlayen be, serbixwe be, hevalê hemû partî û serokan be, hemû rêberên me ne , û sembolên me ne.
-Dameziranding komeleya Xoybûn li gundê Dugirê çêbû ye, û civîn li Libnanê çêbûye.
-Bi strana "Xezal Xezal" û bi saya Pkk ez bûme hunermend.

Hevpeyvîn: Qadir Egîd

Xêro Ebas ji nêz ve kî ye?
Ji Kurdistana Rojava me, li gundê Dugirê sala 1962an jidayik bûme, biçûkaniya xwe de ez hindekî xirab bûm lê kêfa hemûyan ji min re dihat, ew lîstik û xar û zaroktiya gund, û çûna Qamişlo, û Sînema Hedad hîn di bîra min de ye. Ez hîn li ser wan xewn û bûyerên zaroktiyê dijîm, rast e laşê min li Elmanya ye, lê hiş û fikrê min li welat e.

- Têkilî û danûstendina te li gor tu kurê Axeyan bû bi zarokên gundiyan re çawa bû?
Qet tiştekî wisa li cem me di malbatê de tune bû, ne ez tenê, lê hemû malbat, bawer bike derdora bîst gundên me ne, û ta niha ew nêzîkatî bi hemû gundiyan re yek e, em bira ne, tu car em wisa neramiyane.

- Taybetmendiya gundê we çi ye, nexasim ku xwesteka gelek kesên navdar hebû ku li heman gund werin binaxkirin?
Dugir gundekî kevnar e, tenê Amûdê, Dugirê Tilşe'îr û Çilaxa di wê demê de hebûn, hîn Qamişlo kon bûn. Yekemîn malbat ji Bakur peya bûn em bûn, dîrok û rola wê gelekî hebû, kalikên me zanîngeh nexwendibûn, lê mejiyên wan fireh bû, irf û adetê herêmê hebûn, li gel wan têkiliyên me û Ereban xêzeke sor bû, kesê ku ji şoreşên Bakur, ji ya Sasûnê bigir ta ya Şêx Se'îd, çi kesên baz didan xwe li Dugir digirtin, bûbû mîna sembolekê, ta kuramê Simkoyê Şikakî xwe lê girtiye. Û damezirandina komeleya Xoybûn li vir çêbû ye û civîn li Libnanê çêbûye, yekem hêz a ku ji Ereb û Ermena pêk hatibû bo êrîşî Turkiyayê bikin, wê di Dugir re derbas bûbaya. Dugirê hêviya her kesî bû..kurd û Ereb tev de hembêz dikirin. Ew têkilî û peymana di navbera me û Ereban de jî bi saya gundê Dugirê bû. Û ta ez bimirim ez ê pê ve girêdayî bim.

- Xêro Ebas çi hest pê re çêbû ta ku berê xwe bide mûzîkê, nemaze ku tu ji malbateke mezin bû, û ev yek di wê demê de weke şermekê bû?
Bi rastî bavê min mirovekî dimuqrat bû, her dem digot hûn dizanin. Her dem jî tiştek di serê min de hebû, bandora xwe li min dikir ku ez bibim hunermend, di sala 1986an de dema ez çûm Elmanya, saya mezin li ser min ya "PKK" bû, gava min ya yekem a huneriyê ne ji Dugirê destpê kir, min dixwest wê demê, û min li hunermendên mezin mîna Mihemed Şêxo, Şivan , Tehsîn Taha, Ferîd Etreş guhdarî dikir, û min dixwest bistrêm, lê min ji xwe re digot mirovên ku dikare bistrên bê guman divê merovine zana û jêhatî bin. Carnan jî min ji xwe re digot ma çi ye , ne tiştek e, ez dikarim bistrêm..
Li Şamê ez û Selah Osê di odeyekê de bûn, sala 1978an ta 1989an rola xwe li min kir, ta ez di 1986an de ez çûm Elmanya. Di sala 1987an de festîvalek li Elmanya hebû, berî destpêkirina wê bi heyvekê min jî serdana hevalên me yê PKK li wir kir, em rûniştin û koma mûzîkê jî amade bû, hema min ji wan xwest ku hindekî ji me re li mûzîkê bixin, û min jî strana Xezal Xezal got, hemû li min civiyan, û gotin em li tiştek wisa digerin, ji min re gotin dive tu bi me re bikeve komê, tevlî wan bûm û me pileya yekê wê salê stend, û nema ez berdam.
Wisa çêbû, dûv re ez çûm Hunerkom û bi koma Berxwedan re jî derketim, min dûv re biryar da ku ez ji vî qalibî derkevim, û bi awayekî (SOLîS) kar bikim.
Di sala 1998an de min Alboma xwe ye yekem bi navê (Xerîbo) derxist, û gelekî navê xwe da.

- We çi stayl ji xwe re pejirand di wê demê de?
Elboma yekem wisa çêbû, lê min dixwest ez modêrin û kilasîk bixim nav hev, bi formekî ku Ewropî jî bikaribe û yê Kurd jî bikaribe lê guhdar bike. Tu bêjî nebêjî, hindek hunermend li pêşiya min hebûn, û min dizanîbû ku demek ji mirov re divê ta ku em bêjin temam, û niha ez di wê baweriyê de me ku ez biser ketime, ku stayleke min nû heye ta yê Ewropî jî lê guhdar dikin.

"Ew koma Berxwedan bû, û hemû hunermendan ji wir destpê kir, Ciwan Haco, Şivan Perwer, û Bengîn jî li Hunerkom bûn, lê her yek ji wan tiştek di serê wan de bû, lewre her yek bi cihekî ve belav bû".

- Tê gotin ku Xêro Ebas bi dibistana Ciwan Haco bandor bûye, û Ebas Ehmed jî ketiye bin bandora dibistana Xêro Ebas de, tu çawa li vê yekê dimeyzîne?
Koma Botan di sala 1974an de li modêrin û Rok dixistin di demekê de tu kesî nizanîbû Gîtar çi ye, ya dî Dilşad Seîd û girûpa Nêrgiz tiştin dikirin, bê ku ji tu devera bînin. Min jî weke her kesî li stranê guhdarî dikir, lê dema ku min destpê kir, rol û bandora tu kesî li min tunebû, tenê min dixwest bibim hunermend, vêca ew rê çawa ye, ez nizanim. Wek mînak Ebas Ehmed ji min kevintir e, û berî min distra û naskirî bû.

- Te got min sûd ji PKKê girt, ew çawa tê famkirin?
"Ew koma Berxwedan bû, û hemû hunermendan ji wir destpê kir, Ciwan Haco, Şivan Perwer, û Bengîn jî li Hunerkom bûn, lê her yek ji wan tiştek di serê wan de bû, lewre her yek bi cihekî ve belav bû".. Min jî ji wir destpê kir, û gihiştim qonaxekê ku dive ez tiştekî nû biafirînim, Hunerkom wek dibistanekê bû, merov bigihê qonaxekê dive pişta xwe bidê. Piştî 1998an min xwe wek Xêro Ebas da naskirin, û têkiliyên min pê re nema. Û ta niha berdewam e lê ne wek berê ye.

- Di hundirê wê komê de çi li ser we dihate ferzkirin?
Ne tiştek, ji ber ez ne kadirê PKK bûm ta were ferzkirin. Wek mînak Xelîl Xemgîn, Şemdîn, Diyar, Zozan, Mizgîn, û Seyid Xan, ev hemû PKKê bûn, lê ê min na, ez tenê dost bûm.

- Lê her kes dizanîbû nexasim di 1994an de ku derkitina Xêro Ebas li ser wê dikê bi PKK re bû, û her kesî nas kir ku tu PKK yî?
Bi rastî ta wê qonaxê jî ev cudahî li gel min tune bû, min her xebata ji bo kurdayetiyê pîroz dikir, min digot ew ji bo Kurd û Kurdistanê ye û bo her çar perçeyan e. Ta qonaxekê min nû siyaset fam kir, ku her beşek li hala xwe ye, û cudahî heye..
Mixabin.. Ez her dem ji wan re jî dibêjim, min li Kurdistanê jî got hûn bûne dewlet û ji salê ta salê hûn Newrozekê çêdikin û di wê Newrozê de hûn bi hev diçin, lê PKK tiştên wan rêxistinkirî bûn, û bi rêk û pêk bûn, di Newrozan de nedibû tu kesî mey vexwara yan tiştê bê exalqî bikira.. min xwe wilo dît.

- Mana te bi wê rêxistinê re tenê ji bo ku tu bibî hunermend?
Bi rastî ev yek tune bû, lê ew tenê li Ewrupa bûn. Ebas ji min pirsî ku ka em çi bikin, min jê re got her Tv a PKK. Mixabin partiyê Kurdî yê li vir hemû bigihêne hev û bi ser hev de kom bibin, nagihêjin nîvê malbata me ya ku Newrozê li Elmanya lidar dixe.. tiştin PKK jî hene ez jê ne razî me, şaşiyên wan jî hene, min gelek caran dest ji wan berdaye. Û ew rexneyên min qebû dikin.

- Piştî girtina birêz Ebdella Ocelan te karekî hevbeş bi koma Berxwedan re kir?
Rast e, ew stran hate çêkirin, weke serokêşoreşekêûpartiyekê û semboleke kurdan hate girtin, te ji kê bibirsaya pê diêşiya, li her çar perçeyên Kurdistanê, me jî dît ku ew stran wek erkekî li ser milê me bû, wek çawa ku par simfoniya Şingal çêbû,

- Berî çend salan we ahengek li Kurdistanê lidar xist û serokê herêma kurdistanê Mesûd Berzanî tê de amade bû, û te wisa got:"Min ji tu kesî re negotiye serokê min, lê ez ji te re dibêjim", û tu dibêjî ez ne bi siloganan re me..!?
Divê kesê hunermend bêlayen û serbixwe be, hevalê hemû partî û serokan be, hemû rêberên me ne , û sembolên me ne, û em çavê hemûyan maç dikin çi serok Mesûd Berzanî, Ebdella Ocelan, û Mam Celal jî maç dikin.

- Têkiliyên we li Ewropa bi saziyên hunerî yên Ewropî re çawa ne?
Gelekî qels in, min ji wan re straye lê têkilî qels in, dema ku partîyek bana wê hunermend jî yek bana û têkiliyên wan xurtbana, her hunermendek bi partiyekê ve girêdayî ye. Sedema ne pêşketinê siyaset e, û ji hêleke dî ve tu kes ji bilî PKKê ve nîn e. Ez gelekî şad bûm dema ku ez hatim Rojava û min sazî û hêz û hikûmet û perleman dîtin. Ku serokwezîr, wezîrê berevaniyê û yê her tiştî heye, tiştekî pir pêşketî ye.. ev şehîdên ku xwîna xwe di ber me dane, nabe merov xwe di ser wan re bibîne.



- Têkiliyên we wek hunermendên kurd li Elmaniya bi hev re çawa ne?
Tikilî kêm in, ji ber her yek li deverekê ye, û hêza mezin ji wan bi çand û hunera Akadimiyê ve girêdayî ye, û yê dîtir jî tu kes nîne, ji salê ta salê yek Newroz e, û ew jî pevçûn e, çi Newroza ez lê amade bûme problem derketine. Ji bilî Hunerkom tu kes nîn e.

- Hestê te di vê serdana te de, ku tu ji herêmeke azad derbas bû herêmeke azadkirî, çi hest bi te re çêbûn?
Weke hunermend dema ku cara dî hatim Kurdistanê, roja betlanê bû, tev wilo jî sînor ji min re vekirin, û min derbas kirin, herweha ji hêla Rojava jî kêmasî nexistinê, ta bi firavînê dane min. wek hunermend her du alî aliyên min in, tiştekî pir xweş e ku tu ji Başûr derbas bibe Rojava, û hemû kesên li ser sînor kurd bin û bi kurdî diaxivin.

-Elboma te ya yekem (Xerîbo), helbestên wê, belavkirina wê, çi dikarî ji me re li ser biaxivî?
Strana (Xerîbo) ya Ebas Ehmed bû, guman dikim ji deh yazdeh strana bû, yek Mihemed Arif bû, yek Mihemed Xelîl hebû, pêşî ez jê nerazî bûm, lê piştî ewqas deng stend ez jê razî bûm.

- We ta niha çend Elbom tomar kirine?
Ta niha Heft elbom çêbûn, ji wan (Xerîbo – Westiya bû – Barana Şevê – Zor e ..)

- Kesên navdar ku bi te re kar kirine, yan te helbestên wan gotine hene?
Erê min yê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Hekîm Sefqan, û yê Mihemed Şêxo jî gotine.

- Eger ne koçkirina bavê te ba, di serê we de hebû hûn serdana Rojava bikin, tu konsêrta ji bo şoreşa Rojava û Sûrî pêşkêş bikin hebû.?
Bi rastî koçkirina bavê min, tiştekî giran bû, her kes bavê wî bi qedr e, lê dema yê merov be, merov diêşe, me dixwest em werin, werin wan bibînin û vegerin, niha ne wextê hatina min bû, haytina min di heyva pêncan de bû, di heyva sisyan de ez ê bo Newrozê li Ustralya bim, lê mixabin wisa çêbû, dîsan jî di destpêka meha pêncan de, ez ê werim.

- Di nerîna te de mûzîk û hunera Kurdî li Rojavayê Kurdistanê felsefe jê re heye?
Helbet strana kurdî xwedî felsefe ye, û mînaka wê ew strana ku me lê guhdar kir, ya ku te nivîsiye, madam armanca wê heye, wê felsefe be.

- Çima Strana kurdî negihaye asta cîhanî?
Tevger hene, û hunermend bi çarenûsa wê dileyzin, û kesên ku bixwazin bigihêne asteke wisa ew jî kar û imkaniyat jê re divên.

- Çima hun alava Enternet ji bo têkiliyên di navbera xwe û cemawer û hezkiriyên xwe de bikar naynin, û bi taybet weşana Facebookê a zindî?
Gotina te rast e, merov dikare, wisa bike, lê yê min ez vê yekê hez nakim, dibe hindek hunermend ji xwe re propogenda çêdikin, lê yê min ez dixwazim berhemên min derkevin û bigihên ber destê cemaweran, ez dixwazim tiştekî baş bikim.

- Ji we hatiye xwestin ku hun di ti filman de rola lehengiyê bileyzin?
Belê, hunermend Huner Selîm dixwest ez di filmekî wî de beşdar bibim, çîrok li ser pêşmergeyan bû, û ez jî tê de wek stranvan im, lê bi rastî min xwe tê de nedît, min dî ji min re zor e.

- Ji bo hunerê çi xwestek û hêvî li gel te hene?
Di dilê min de heye ku carekê ewqas siyasetmedar bibin yek, ku ê nivîskar û derhêner û hunermend bi hev re tiştekî wisa bi awayekî simfonî çê bikin, li her çar perçeyên Kurdistanê belav bibe, mîna strana (Xewna Erebî) ku hunermendên Ereb pêk anîn.

- Ji bo hunermendên nifşê nû tu çi şîretê dike?
Dixwazim ku li ser strana xwe bisekine, bi kesekî ve ne girêdayî be, mûzîka xwe bi awayekî zanistî bistîne, û netirse ji huner û hunermendan.
- Em ê hindekî nêzî jiyana te ya malbatî bibin.
Ez xwedî hevjîn im, kureke min ji hevala min ya Elmanî heye navê wî bi Elmanî Yonas e, anku Yûnis Pêximber "24" salî ye, û keça min Rona jî 22 salî ye, ew ji keçamê min e

- Eger Xêro Ebas bi tena xwe bimîne li kê guhdar dike?
Mixabin ev çend salin em li şer, kuştin, û wêrankirinê guhdar dikin.. lê carnan ez li Kawîs Axa guhdar dikim. Nifşê nû ez li Şerîfê Omerî guhdar dikim, û eger li virba minê alîkariya wî kiriba.
- van gotina bi yek peyvê şîrove bike.
* Rojavayê Kurdistan: Giyan û jiyana min e.
* Helbesta Kurdî: Taştê û xwarina min e, ez pê dijîm.
* Hunera Kurdî: Pê serbilind im.

- Hun ji kê re dixwînin?
Bêtir helbestê dixwînim, yê kevin, û kilasîk mîna Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj.
- Gotina dawî.
Spasiya we dikim û hêvîdar im, ku em hemû ji vê rewşê derkevim, dixwazim kurdên me hindek sebirê bikişînin, em dibînin li bajarê xelkê wek Helebê çi çêdibe, û em bi aramî dijîn, gerek em vî şervanê ku xwe û giyanê xwe di ber me de dide jibîr nekin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Werrte (ورطة)

Dema me lêkolîn li koka vê peyva watedar kir, û bi çend zimanan hatiye bikaranîn, bê gûman em di nav gilî û gazin û xemgînyê de winda bûn, çawa Ermen dibêjin ew bi xwe peyvek Ermenî, resen e ji ber pir navên Ermenan Wartan hene, û gelek caran pişta xwe bi Rûsan girêdan, ji bo azadiya gelê Ermen ji zordestiya Osmaniyan bi şoreşa radibûn. Ya dawî sala 1915an bû, lê Rûs pabendî sozê xwe nebûn, û gelê Ermen di nava devê guran de hiştin, di encama wê serhildanê de bi milyonan Ermen qir bûn û derbider bûn ,bajar, zevî , gundên wan Osmaniyan desteser kirin, yexme kirin , ma ne hêja ye ku em bêjin ev peyveke Ermenî ye, û resen e..!?

Ji xwe kurd dibêjin na bavo ê me bi dehê caran me pişta xwe bi dagirkeran girêda û me ji sozên wan bahwer kirin lê di paşerojê de li sozê xwe nebûn xwedî û bûn mîna dûvpişkan bi me vedan komkujî derheqa mede bikaranîn malê me yexme kirin , em sorgunî deverên biyanî kirin ji ber wilo kurd li tevaya cîhanê belav bûne ji Evxanistan ta Pakistan ta Misir ,û Sûdan, ji xwe li welatên Ewropî bi giştî çawa yekem selîm soz bi kurdan re da dema ku kurdan piştgirya wî kirin dijî Sefewyan û di encamê de Kurdistan dabeş bû di navbera Tirkan û Farisan de ,wê hingê sultanê navbûrî got : Wê hemû herêm û navçeyên kurdistanê xweser bin bi rêvebirya kurdan bin , lê di paşerojê de li sozê xwe nebû xwedî û kurd ketin werrteke mezin welatê xwe bi erzanî dabeşkirin di navbera neyaran de cara didwan Kemal Etatirk di sala 1920 an de dîsa kurd werritandin bi sozên derew got: Heger kurd piştgirya min bikin dijî Îngilîz û Firensiyan ezê bihêlm herêma kurdî xweser û , azad be , lê ewjî wek yê berî xwe sozê xwe xwar û komkujî derheqa kurdan de bikaranîn , kurd bi wîji werrtîn cara dawî , peymana di navbera Sedam û bavê netewa kurd Barzaniyê nemir sala 1970tê naveroka wê peymanê wê herêma kurdî li bakurê Îraqê xweser be lê di dawyê de Sedam li emze û mohra xwe nebû xwedî peymana koletiyê 30 Î salî bi sovyêt re danî û beramberî wê peymanê Sovyêt çekên giran bexşî Sedam kirin û bi handana şahê Îranê ew şahê ku soz dabû kurdan wê piştgirya wan bike û dest ji wan bernade dijî Sedam lê dema berjewendî hatin holê ewjî li sozê xwe nebû xwedî , Sedam enfal û cînosayid derheqa kurdan bikaranî ta bi çekên kîmyawî bêhtir ji (4500) gundên kurdan wêran kirin dûz kirin ma ne hêjaye ku em bêjin ev peyveke kurdiye .

Lê Ereb dpbêjin Taw-Taw ne tenê ev peyveke Erebiye belê kurd , Aşûr , Siryan , qad û petrol tev Erebiye yê

Bavê Serbest

mejî gelek caran bi rêvebir û serkêşên me soz dan ku wê netewa Ereb bikin yek û wê jiyana Ereban bi vê yekitiyê pir aram û xweş bibie cara pêşî Cemal Ebdelnasir bi silogana yekîtiya netewê Ereb û soz da Ereban wê bihêle Ereb bibin hêza sisyan di cîhanê de piştî rojhilat û rojava û bivî awayî bû wek hêvî û simbolek Erebî Ereb bi giştî weritîn bi piştgirya wî lê di piraktîkê de Yemen bû dudo , Îraq perçe bû Sûrî piçik piçik dpbe , Misir , Lîbya , Cezaîr li ser dorêne hate nasîn ku ew siloganên birqonek tev derew bûn .

Tew Hafiz Esed got : Di nava civîna encumena Sûrî de ezê bihêlim ku Colan têkeve nîvê netewa Sûrî û ezê Cihiwan ji van deveran bi qewitînim lê di dawyê de Colan , Qetena ,Qinêtra tevde çûn , ma gelo ne hêjaye em bêjin ev peyvek Erebiye .

Di dawî de ez ê bersivê bihêlim ji xwendevanên hêja re bê kîjan nijad ji van hersiyan bêhtir hatiye xapandin û weritye .

Dîrok û Sernavên Gundekî.. Gundê Şêtika

Mihemed Zekî Mihemed

Wergerandin: Mihemed Zekî Mihemed.

Ev agahî ji devê Ebas kurê Mihemedê Mirad, ku di sala 1933an de, li gundê Şêtika jidayik bûye, û hin jêderên din di gund de hatine girtin.

Evî gundî navê xwe ji girikê Şêtika yê di gund de biriye, herweha girik jî ji giyayê (Çîtikê) ya bilind ku di çemê ku di rojhiltî gund re diherikî wergirtiye, roj bi roj nav ji (Çîtka), sivik bû ta niha bi (Şêtika) tê binavkirin.

Gundê Şêtika di navbera (1900-1903)an de ji hêla hoza "Hemka" bavekê "Hesenka" ve ava bûye û ji cîwarbûnê re amade bûye.

Di sala hezara 1960î de, ji encama Xeta Dehan, ango pirojeya "Zinara Erebî" ya nijadperist û bi mebesta Erebikrina herêma Kurdî navê gundê (Şêtika) kirine "Elyememe".

Ji aliyê rêvebiriyê û li gor dabeşkirina hikûmetê, bi qeza Çilaxe ve girêdayî ye, lê li gor dabeşkirina Rêvebiriya Xweser bi Qeza Tirbespiyê ve hatiye girêdan, gundê Şêtika (24)km ji Çilaxe û Tirbespiyê dûr e, herweha (3) km ji sînorê Turkyê dûr e.

Sînorên wê yên xaknîgarî: Ji Rojava ve gundê Dêrûna Qulonga ye, ji Başûr ve gundê Elî Bedran û Babasî ye, ji Bakur ve gundê Etbê û sînorê Turkyê ye, ji Rojhilat ve gundê Xirabê Reş, Dêrûna Axê û gundê Qaşto ye.

Dema ku gundê Şêtika hate damezrandin, (20) malbat di damzrandinê de pişkdar bûn, lê hozên ku di gund de hene " Basiqla, Hemeka û Seyid" in, tevî hin hozên din jî lê cîwar bûne, ji hêla nişteciîbûnê ve, di heyameke aram de dijiya, berî şoreşa Sûriyê ya 2011an jimara xaniyan (43-44) xanî bû, (jimara şêniyên wê niha dora 400 kesî ye), tevî ku hin malbatan ji gund bar kir, lê malbatine din ciyê wan girtin, gundî tev de mislman in.

Gundê Şêtika bi gelek sernavên xwe navdar e, û ji hemî aliyan ve, li hêla Rojhilat gelek kanî hene ji wan " Kaniya Kera" weha hatiye binavikirin ji ber ku çêriya keran li dora wê bû, û "Kaniya Mewîjan" ew jî gundiyan mewîj li qiraxa kaniyê çêdikirin ji bo vê yekê ev nav lê haitiye kirin, û "Kaniya Hesen" li ser navê Hesen ku kanî kolaye, û yek ji damezrênerê gund e, hatiye binavkirin, li Başûrê gund û bi aliyê gundê "Elî Bedranê" de, "Kaniya Hêştir" heye, li Bakurî Rojavayî gund kevirekî kolayî heye bi (Şeharê bi Hewd) tê binavkirin, av tê de kom dibû, ji kevn de şênî û şivanan jî ji bo avdana sewalên xwe sûde jê werdigirtin, lê niha ew kevir nema ye, ev senavên xuristî ku ji serdema bav û kalan e, bihna mirov bi wan derdikeve û fireh dibe.

Ji hêla xizmetguzariyên hikûmetê ve, dibistaneke sertayî û tora bihîstokê li gund heye, lê ji hemî xizmetguzariyên din mîna riyên qîkirî..... bê par e.

Rûbera xaka çandiniyê li gundê Şêtika (700) donim e, bi sedema serastikirna sînorê di navbera Turkyê û Sûryê de, (250) î donim jê hate parçekirin û li Erebên Mexmûrî hate belavkirin, li gorî agahiyên ku navbûrî anîne zimên, ku xaka çandiniyê bi şêweyekî dadmend têra hemî malbatan nake, ew jî ji encama ku zagona çaksaziya çandiniyê ji belavkirina pêşîn re ji sala 1960î ve ta niha weke xwe maye, lê xaka sûdewergir (الانتفاع) ku hîn hikûmet kirya wê distîne, rûbera wê (1000) donim e, di navbera Erebên Mexûrî û cotkarên gundine din de hatiye belavkirin.

Di wê rûberê de şêniyên gundê Şêtika (Birinc, Garis, Ceh û Genim) diçandin, rezên Tirî jî pirbûn, ji encama salên ziwayî yê "salên xelayê yê", îdî neha bi ser tunebûnê de diçin, ew cureyên çandinyê yên kevin bi Gijninj û Kemûnê hatine guhertin.

Herweha ji hêla sewalvaniyê ve, pez û dewar lê dihatin xewedîkirin, mîna hesp, hêstir, mih, çêlek, bizin û gamêşan, û çemek ji Başûrî gund ve diherikî û di Rojhilatî gund re derbas dibû, lê di van salên dawî de ziwa bûye, û ji giyayê Burdî û Çîtikê re şîngeh bû, em dikarin bêjin ku Şêtika gundekî pîroz e , ji ber ku gora (ziyareta) Mela Remezan di gund de ye.

Ji kevin de gundê Şêtika bi nîştimanpeweriya xwe navdar e, bi sedema ku gelek kesayetiyên welaparêz di gund de hebûn, û xwedî dîrokeke dirêj di têkoşîn û xebatê de, bi dizî û di tariyê de cejna Newroz a netewî lê dihate vejandin.

Ji ber ku Şêtka cîran û sînordarê gundê Babasî û Dêrûna Qulinga bû, pişkdarî di bervaniya di ber Dêrûna Qulinga de kiriye, dema ku leşkerên Turkiyê êrîşê wê kirin, di encamê de efserekî Turk hate kuştin, herweha gelek zor û stem ji hêla rijêma Sûriyê ve dîtiye û ji kiryarên awarte bê par nemaye, ta vê rojê jî hîn ji yek malbatê kesin bê nasname mane (Mektûm), û navbûrî yê ku ev agahî li ser gundê Şêtika ji me re pêşkêş kirine, carekê hatiye girtin û gotinên dûrî sincên mirovatiyê dane riwê wî, tenê ji ber ku Kurd e.

Jêder: Rûpela Çarçira ya Fêsbûkê

Bandora Xwarinê Li Ser Tendûristîye

Tendûristî û xwarin bi hev re giredayî ne. Ji ber ku tentûristî bi karbonhîdrat, proteîn, rûn (dohn), vîtamîn, av û mineralên ku ji xwarinan dertê ve girêdaye. Naxwe em dikarin bi rehetî bibejin ku tendûristî çi erênî çi neyînî bi xwedîkirina me an ku bi xwarinên me ve giredayî ye. xurtbûn an lawazbûna laşê mirov bi xwarina mirov re giredayî ye. Bi gotineke dî ji bo jiyaneke bi tendûristî û ji bo jiyaneke ku bênexweşî dibe mirov li xwarinên xwe baldar be. Her çiqas ev xwarin ji hêla karbonhîdrat, proteîn, rûn (dohn), vîtamîn, av û mineralan ve hêzeke bide mirov ji kêmbûn û zêdeyîya wan jî xisarê dide bedena mirov. Dema bedena mirov nexweş ket pê re jiyana civakî û jiyana psikolojik jî xisarê dibînê. Naxwe em dikarin bibejin ku ji bo jiyaneke civakî ya hêja dibe tendûristîyeke baş jî hebe.

Xwarin raste rast bandoreke mezin li ser tendûristiyê dike. Ji xwe ji bo jiyanê xwarin mecburî ye. Said Nurî bandora xwarinê ya li ser tenduristîye li ser navê Îbnî Sîna wiha dibejê; "Eflatûnê filozofê Îslamê, şexê bijijka, hostaye filozofa, hişmend û namdar Ebû Elî Îbn-î Sîna, tenê di nuqta tenduristîyê de; ayeta Bixun, vexun, lê belê îsraf nekin. (Suretê Eraf : 31) wuha şirove kiriye. Dibejê; zanîna tenduristîyê ez di du rêza da ber hev dikim. Bedewbûna gotinê di kurtasiyê de ye. Dema te xwar hindik bixwe, piştî ku te xwar heta çar-penç seata tiştekî nexwe.

Derman di xwarin-serfandinê de ye. Yanî biqasî ku tu dikare biserifîne bixwe. Ji nefs û aşik re tiştê herî giran û nebaş xwarin li ser xwarinê ye. Yanî ji bo bedena mirov tiştê herî nebaş heta çar-penç seat derbasnebûyî xwarin li ser xwarinê xwarine û ya ji bo tahmê xweş bi xwarinên cûrbecûr aşik tişikirine.

Bandora Xwarinê Li Ser Tevgerên Mirovan: Îbnî Xaldûn di pirtûka xwe ya navdar de li ser mijara xwarin û tevgerên mirovan diraweste. Li gorî Xaldûn xwarin bandoreke mezin li ser jiyana mirovan ya derûnî û exlaqê mirovan dike. Xaldûn mirovan dixe sê beşan.

- Mirovên ku li deverên çiya, çol û ziwa dijîn, mirovên ku

Dilzad Art

li van dera dijîn zîrek, çalak, jêhatî, bitevger in. Bedena wan paqij e. Têgihiştina wan zêde ye. Ev mirov hindik dixûn û ji bo ku xwarinê bidest bixin gelekî dixebitin.

- Mirovên ku li deştên bibereket dijîn; mirovên ku li van deran dijîn ji ber ku xwarin geleke kêm dixebitin. Ev mirov qelew û teral in.

-Mirovên li bajaran dijîn, mirovên ku li van deran dijîn ji ber ku xwarinê bihesanî bidest dixin bedena wan nazik û tenik e. Bi vî awayî derûniya wan jî nazik e. Ji ber venaye ku gelê bajaran bi hûnerê ve daketîne.

Li gorî van tesbîtên Xaldûn kurd dikevin asta yekemîn de. Ji ber ku kurd bi taybetî çîyayî ne bedena kurdan jidahî ye, zîrek û xebatkar in. Ji ber ku bedena wan saxlem û hişk e ev bandorê li exlaqê kurdan jî dike.

Jin û Tundî

" Jin nîvê civakê ye " gotinek gelekî belav e û her kes dike silogan ji xwe re dema ku bi mafên jinan bang dike.

lê di hundirê her malbatekê de, di civaka me ya kurdî de tundî li dijî wî nîvê civakê tê bikaranîn, dema ku tundî tê gotin ew bi tenê lêdan tê hişê merov û ne bi tenê ew lêdana normal, lê divê ku lêdanek dijwar be û nîşana wê li ser laş hebe, lê ew tundiya ku dijî jinan tê bikaranîn gelek rengên we hene, lê mixabin di civaka me de dibe karekî normal ji mêran re û ew tundiya civakî,polîtîkî yan jî abûrî naxe di bin navê tundiyê de, ew dike mafek ji mafên mêran di jiyana rojane de çi bav û bira yan jî hevjîn be û ew tundiya ku bikar tîne dike bêhinvedaneke ji mêr re, ji ber strêsa karê wê yê ji derve ta ku hewcedariya malbata xwe bi cî bike.

gelek caran jin bi xwe dihêle ku ew tundiyê Li ser xwe bikar bîne, dema ku neaxive yan neraghîne ew tundiya li ser wê dibe, bi devgirtina wê ew dihêle ku zêdetir bibe, li ser wê herwiha li ser jinên derdora wê,lê dîsan jin dibe sedem dema ku ji biçûkaniya zarokan di hundirê Malbatê de ew cudahiyê di mêjiyên wan biçîne û gotinên civakê bi wan re rake ku gotina mêr divê ya yekem û dawî be û jin her dem bin destî wî be û di her malbatekê de divê ku serdestî di destê Mêran de be û jin ji kar û barê malê û xizmeta mêr bi tenê be û çiqas gotinên ne xweş bêje ew ji mafê wî ye û erkê jinê ye ku venegerîne ta ku tu pirsgirêkan çêneke di hundirê Malbata xwe de.

ev çand ji nifşekî derbasî nifşekî nû dibe bilî ku cîhan bi tevahî pêş dikeve ro bi ro û her roj piryarên cîhanî û peyman derdikevin derbarî vê pirsgirêkê lê jinên me ta niha bi tu peymanan nebihîstinin yê ku welatên cîhanê bi tevayî li ser her xalekî ji xalên wan peymanan bi salan dirawesti ta ku mafên van jinan biparêze.

lê mixabin ta niha belkî jinên devera me yên kurdî tuştekî nizanin li ser peymana Sîdaw ya ku ji sala 1981ê de hatiye bikaranîn û bêhtirî 186 welatî li ser îmze kirine, û di nav wan de Sûrî, ya ku li ser hin xalan îmze nekir ji ber ku dijî rawiştên ku di civakê de tê bikaranîn yan ji dijî gotinên yasayên Sûrî bûn weke xala ku digot ji mafê Jinê ye ku malekê ji xwe re hilbijêre ku tê de jiyana xwe bi tenê berdewam bike dema ku bixwaze, herwiha xala ku ji mafê Jinê ya ku regeznameya xwe bide zarokên xwe

Kaçiya Osman

û gelek xalin dî yê ku mafên wê biparêze di her warê jiyanê de, lê jinên me çavên xwe digrin li ser van xalan û mafan û gotinên civakê dikin bengeha avakirina malbatan û bi taybet şîretên daykan ji keç û xortan re yên ku di destpêka zewacê de ne, ta ku ew gotin û çand bighêje nifşê nû û tu car winda nebe.

Tu çareserî ji pirsgirêka diyardeya tundiyê tune ji bilî zêdekirina asta têghiştiya giştî û ku jin mafên xwe bi tevayî nas bike û fêrî pemanên cîhanî bibe û kesayeta xwe ya bi tena xwe lêke ta ku miroveke rewşenbîr û serbixwe be ji ber ew civak bi tevayî ye,

dema ku ew alîkar be bi xwe re wê demê bi tenê tundî li dijî wê bê rawestin û bi dawî bibe lê ta ku ew cudahiyê dixe navbera keçan û lawan de di hundirê heman malbatê de ew tund tu car bi dawî nabe çiqas netewên yekbûyî civetê biryar û peymanan ji jinan re derxîne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Helbestin Bijartî "Şepal Hêvo"

Di 21 Avdara sala 1984 an de li bajarê Qamişlo li taxa Qedûrbegê jidayik bûye.Xwendina xwe ya seretayî li dibistana FEYSEL EHMED bidawî kiriye.
Di sala 1996 an de ta sala 1999 an de li dibistana Tişrînê xwendina xwe ya navendî bidawî kiriye û ji ber hin rewşên taybet du salan dûrî xwendinê ket.

Reviyayî

ji himbêza tirsekê
ji awirên bajarekî zerhimî
û di rê de..
berî ku li giriyê xwe bilukme
di bin serê sînorekî tevizî de
tembîniyên xwe yên jikoketî
veşartin.

Gavên wî

yên teqinî di xavika peyvê de
peyvên ku di paşila helbesteke nemeyayî de
bavanên bendewariyê pîne dikirin.
Reviyayî
ji sirûda xwe
ji qada xwenê
xwenên ku di destê sibeheke reben de jidayik dibûn.
Û ji nişkan ve
berî ku oxira xwe bidarve bike
rişma dengê xwe sist dikir
û ji mukrbûna xwe peya dibû:
Ez şahsiwarê êşa xwe me
tewanbarê binavkirina vê windabûnê me
û heyvanê şikestina xwe me,
lê hîn jî di gora kena xwe de
ez hestiyên dengê xwe cebar dikim
û keziyên sitrana xwe hine dikim.
Reviyayî
Ji pêçeka xwe
ji dergûşa xwewindakirinê
û hemî bendên ku di serê wî de dilîlandin,
malneketo
tu ji kê re
ji kîjan bêbextî re
vê çîrokê ditivtivînî
tu yê terqiyayî ji lehengiya xwe.
Reviyayî
ji dengvedana gavên xwe
ji pit-pita van rojên zexel
ka destê vê peyvê bigre
û were em bi hev re
weke du cêwiyan
termê vê helbestê binxumînin
bi korîma me be
em yên ku bidawî nabin.

Şopên soringkirî

Ji xavika peyvê
ber bi zayîna bêrîkirinê ve
diherikin
lavijên te yên hinekrî
û min ti yezdan ji vê kêlîkê re
nebijartiye.
Ji xavika peyvê
ber bi qulincên asîmanan ve
dizrin
şevên te
yên newqbûyî di kavilên çavan de.
Ji xavika peyvê
ber bi wateyên diryayî ve
henasên çengokirî
hêsirên mendalekî soring dikin
û hîn jî vedenga guleyê
mizgîniyan diporisîne.
Ji xavika peyvê
ber bi dergehê mala me ve
helbesteke
pêxwas
bi heftokan dilîze.

Şevên netebitî

Wisa min soz dabû nivîsandinê
eger çavên min ji hembêzkirina baranê biweste
û guhên min ji pit-pita rojan bireve
ez ê xwe bîn im
û di ber pişkokên sînga te re
bi qaçaxî, hinekî ji hilma memikên te birevînim
lê hîn jî tarî bidawî nebûye
ez û sîka xwe ji nû ve hev nas dikin
geh li pêşiya min rûdine û bi min re mijûl dibe
geh jî mîna zrokekî li pişt min lotikan dide.
Wisa min bêriya te kiribû
dema destên şoreşê di paşila xwînê de
li azadiyê digeriyan
û dema dengê min bi guleyekê re direviya
lê hîn jî darên zeytûnan bi bejna xwe
pakrewanan dilorînin
û çavên min yên kewijî
ji dîmenên tewş têr nebûne.
Wisa tu dihatî
dema nîgaşê min dimeya
û hemî êşên min diherikîn
te ji hemî hêlan
êrîşî min dkir.

Di destpêka sala 2oo2 an de bi şêweyekî azad xwe li zanîngeha Lebanese International University tomar kir û xwendina rojnamegeriyê li wir bidawî kiriye.

Di Cizbeyên herifî de

Xwêdan ji qatên eniya rûpelê diherike
û bergehên mebestan
mirêkên westanê ne
gewriyên daxdayî ne
lê kes nizane çi govend di vêlbûna birînê de diqewime.
Ez û tu misoger in
hedana giriyê me nayê
timî em ji hev dibarin
û bi tenê
di berbangan de
di nîgaşê helbestvanekî de
bi dirêjahiya çavşikestinekê dîdara me didome.
De danişe
ji bihîstinên xwe yên bilind
ji ritima bablîsokê
û were
berî ximav
hêç bibe.
Xwêdan ji lêva pênûsê diçipçibe
û awirên te
devgirêdanên sawê ne
pîneyên tirsê ne
lê kes nizane
ku tu di gewdeyê axê de
li damarên tûzikê
gelicî ye.
Gelo
Katjimêra te li derdora kîjan xewnê terpilî ye?
de rapelike
Ji bin qemûşika peyvê
were
û vê xezebê bawî bike.
Xwêdan ji hingilên peyvê dadwerive
û çavên te
yên kilîtkirî
mamikên oxirê ne
kalanên girî ne
lê kî dikare rêşiyên henasên te veçêre?
Kî dikare te ji cizbeya van kêlîkan rawestîne?

Kobanê

Tu yê çawa pêşwaziya min bikî
li ser darbesta kîjan helbestê
oxira min werbigrî
ez yê ku di taya nivîsandinê de
bînberdana lehengekî hembêz dikim
tu ji hemî birînan delaltirî
ji hemî êşan xweşiktirî
tu ya tivtivandî di xemla berxwedanê de.
Kobanê
lîlandina ku berî guleyê dihrike
guliyên ku di bin siya barûdê de diçirisin
û dayikên ku bi tîna kezeba xwe
nanê serkeftinê dipêjin
ev hemî tabloyên te ne
yên pirtikandî bi tiliyên yezdanan
û hîn jî tu xwe diyarî mirinê dikî
dikenî
û ji kenê te bêrîkirin dadweşe
bêrîkirina axê ji şopa zarokekî re.
Kobanê
xeftanê kokirî di kevanê sitranên te de
huçikên girêdayî bi qundaxên tivingan ve
û rêşiyên ku dibine agir di şevên te de
ev hemî xelatên te ne
bîna giriyê dayikan ji wan tê
û dem ji sînorê peyvê vedikşe
lê hîn jî
di guvaştina xwe de teqinî me.

Her sibeh

pêçeka helbestê
li ser têla ramanan radixim
li bendî ku bayê dilê te
ji henasên şevan rizgar bibe.
Her sibeh
pirsên xwe di çavên zarokekî de vedişêrim
rişma rewanê xwe sist dikim
û yekser
berî ku girî di çavên te de jidayik bibe
xwe ji banê dîmenê wer dikim.
Her sibeh
xwazgîniyên tenêtiya min
bi min re
di tabloya jiyanê de
termên hevokan dinjinînin.
Her sibeh
û berî ku ji xatirxwestina sibeheke din riha bibim
ji welatê xwe re diçim
SICÛDÊ
FATIHEYKÊ li ser giyanê helbesta xwe dixwînim
û bi lez
berî ku ronî şikestinên xwe cebar bike
hêdî ... hêdî
ji xwe vedikşim.

Di sala 2008 an de li weşanxaneya Zeman dîwana xwe ya yekemîn bi navê Gavên Windayî çap kiriye.
Di sala 2010 an de li Şamê Dîwana xwe ya duyemîn bi navê Artêro çap kiriye.
-Di dawiya sala 2011 an de jindar bû û niha du zarokên wî hene.
Li Bakurê kurdistanê li bajarokê Nisêbînê sê salan koçber ma bû.



Tenê bihêlin ev sal bêyî min derbas bibe

Her kes ji me carnan xayiz dibe,
nema tiştek di wê kêlîkê de dilebite
û bi tenê tu ji xwe re dibêjî ku ez ne li vir bûm.
Ji nişkan ve yê li kêleka te nebedî dibe,
wisa jî ji neçarî tu pirsa xwe dadqurtînî.

Lê hîn jî ew pirs di hinavê te de kêferatê dike,
hewil dide ku careke din te xayiz bike,
te ji te bistîne qena tu bi tenê xwe bijî.
Di xirecira lêpirsînê de yekser tu destê xwe tavêjî çixareyê vêdixî, dikşînî û hîn jî tu ji davên xwe yên nediyar ditirsî.
Demjimêrên cîhanê wê kêlîkê di serê te de radiwestin,
rê dibin çavên te çav dibine
rê her tişt tevlîhev dibe
gêj dibî,ba di sînga te de teprepê dike
lê kes derî jê re venake.
Hêdî hêdî tu ji lêpirsînan vedikşî
birayara mirina xwe bi destê xwe didî
lê kês dengê te nabhîze.
Destên xwe li çavên xwe dipelînî
weke ku mifteyên te ji destên te ketibin
lê bi ser wan venabî,
nagihêjî dîtinên xwe.
Dîsan ji derdora xwe dipirsî:
Kes dengê min dibhîze?
Ger henek be ji dil ji min re bibêjin!
Lê pêjina kesî nayê.
Kêlîk berfirehtir dibe
şaxên wê di damarên te re diherikin
serê te ji gewdeyê te girantir dibe
û tu ji xwe dipirsî:
Kî min radestî vê kêlîkê kir?
Dibe ez di maka xwe de bim,
lê bi qatî wê dengê dayika min bihata min.
Ez lawê kîjan bêbextiyê me?
Li nasnameya xwe digerim,
lê kes nikare min bi min bide naskirin.
Ji vê kêlîkê û bi şûn de ez ê bi tenê dengê xwe bibhîsim
dengê tik-tika dilê xwe
ew bi kur ve min bibe,
bi tenê ez ê bibim bela serê xwe.
Lêvên xwe yên ku bi pêsîra peyvan ve zeliqî ne
weke rêşiyên ji agir dihûnim,
lê ber bi kîjan mukurbûnê ve diçim
ew jî nediyar e.
Dergehekî qedexe me
newêrim xwe ji xwe re vekim

Nihali Elmaniyayê Li Bajarê Solingen dijî. Ji bilî Zimanê Kurdî,Erebî ew bi zimanê Tirkî û Elmanî jî diaxive. Berhemên neçapkirî MOHR (Helbest) BIÇÛK BÛ (werger) şano Jibîrkirin. Com (werger) Roman

ditirsim li ber lehiya vê tenêtiyê
kakilê mêjiyê min der bibe.
Nema dikarim xwe li ber vê kewijandinê zeft bikim
lê ez hîn jî di cizbeya xwe de me,
rikberiyê bi van mizgîniyan re dikim.
Eger hun xayiz bûn,
hunê pêrgî min bibin, lê eger ez ne li wir bûm,
hun dikarin ji wan kêlîkan bipirsin,
çendîn dilê min dibijya dîtina we.
Dilê we bi min neşewite!
ji bêmicaliya vê mukurbûnê şerm nekin
tenê bihêlin ev sal bêyî min derbas bibe.